




Mûsa



DANNY BELANADI/19





Published by the Comic Bible Society, LLC
Copyright © 2021

Kingstone Comics maintains copyright to this comic book as provided by United States copyright law.

Print and digital copies of this version may be freely distributed without penalty under a Creative Commons license.

Di dema xelayê de, Aqûb, ku neviyê Îbrahîm bû, yanzdeh kurên xwe û hemû zarok û xadim û xulamên wan birin Mîsrê da ku li wir rûnin û bijîn.

Navê Aqûb hat guhertin û bû Îsrâil. Di demeke kin de kurên Îsrâil ji Mîsriyan zêdetir bûn.

Serwerê Mîsrê, Firewn, kurên Îsrâil bi karên giran eziyetê li wan kir.

Firewn, ji tîrsa ku Cihû pir zêde dibûn, biryar da ku hemû kurên nûzayî bikuje.

Pîştî 300 salan ji xulamtiyê, gelê Îsrâil sozên ku Xwedê ji bav û kalên wan re dabû ji bir kiribûn.

De rabe, ey kûçikê İbranî!

Bila rehma te li min be— Ez nikarim bêtir bixebitim!

Xwedê ji İbrahîm re gotibû wê gelê wî li welatekî xerîb bibe xulam— Lê piştî 400 salan ew ê wî mîletê dadger bike û gelê xwe vegerîne Welatê Sozdaiyî.

Na! Ne zarokê min. Tu dest lê nedin!



Lê dayê, ez ê ji leşker
û cîranan re çî bibêjim
dema ku ew bipirsin
kurê me li ku ye?

Tê ji wan re tenê
rastiyê bêjî. Diya wî wî xist
li ser çemê da ku leşker
wê yekê bi wî nekin.

Lê dayê,
tu piştrast î wê
dilop neke?

Ew bi qîr û
qetranê hatiye
sewaxkirin.
Ew ê seravê
be.

Gelo em ê
careke din birayê
xwe yê biçûk
bibînin?

Wê Xwedê wî
biparêze. Tu ji dûr
ve bisekine û
binêre.




Keça Firewn hat ber
çem ji bo ku xwe bişo.

Hele bibihîsin!
Dengê girînê ji
wê selikê tê!


Divê ev zarokê
Îbraniyan be.

Ew bê
guman
birçî ye.



Ez ê wî li ba xwe
bihêlim heger ez
yekê ku şîr bide wî
bibînim.

Yek ji wan zarokên
Îbranî heye. Dibe ku ew
yekê nas dike ku şîr
bide wî û li wî binêre.





Xwedê kir ku Mûsa mezin be û heta ku wî koka xwe jî qet ji bîr nekir.

Mûsa, ez ji te re dibêjim ku Xwedayê bavkalên me, Îbrahîm, Îshaq û Aqûb, ji Îbrahîm re got wê ziriya wî zêde bibe û ew ê li welatekî xerîb werin hesibandin. Va ye, gotina wî hate cih!

Wî her wiha ji Îbrahîm re got ku em ê 400 salan li wî welatî xerîb cefa bikişînin.



Û ew ê wî miletî jî bo xerabiya ku wê bi me bikin dagder bike û em ê bi dewlemendiyeke mezin derkevin û vegerin welatê ku Xwedê daye bavên me.

Wê Firewn qet nehêle ku hemû koleyên wî ji ber wî ve derkevin û bi xwe re hemû mal û milkên xwe hildin û bibin.

Zarokên Îbranî di bin serweriya malxweyên xwe de êş û cefa kişandin. Divê ew di çal û kortan de bixebitiyan û kelpîçan çekiriban. Mûsa nikarî xwe li ber dîtina êşkişandina wan bigire. Loma wî biryar da ku tiştekî di derbarê wê de bike.



Rabe, ey berazê pîs!

Hele rabe berî ew te heta mirinê bixe!

Eber, hele rabe.

Rojekê Mûsa dît ku yekî
Mîsrî li yekî İbrânî dixê.

Va ye dema
xilasbûnê hat. Divê ev
yeka were dawiye.

Lêxel!

Edî
bes e!

Mûsa yê Mîsrî kuşt û laşê wî veşart, lê yekî ew
bi çavê xwe dît û ji Firen re hertîşt ragihand.

Hele bisekine,
divê tu ji bo
kuştina wî
Mîsrî werî
dadgerkirin!

Ev Mûsa ye!

Ma min
çî kiriye!?

Nêzîkê sala 1491an B.Z.

Mûsa ji Mîsrê derket
û reviya çû li nav çolê.

Ew bi tena serê xwe bû,
bê malbat an heval.

Wî ne gelê xwe û
ne jî xwe xilas kir.



Mûsa gelek rojan meşiya. Gava ew nikarî bi pêş ve biçê, wî çû ba wargeha şivanan.

De binêrin!
Zilamek!

Ew Misrî ye!

Ew hema hema
mirî xuya dike.
Hele avê bînin.

Çiqas ecêb e!
Ew çima agirek di nav
deviyê de hebû û devî
bi xwe jî naşewite?
Ew hê dişewite û
dişewite.



Min tengasiya gelê xwe ya li
Misrê dît û hewara wan jî bihîst.
Niha divê em wan ji bindestiya
wan rizgar bikin û wan
vegerînin welatê ku min
soz daye bavên wan.

Ez ê te bişînim ba Firewn
û tê gelê min ji bindestiya
wan derxîni. Tê jê re bêjî
bila destûrê bide gelê min
ku derkevin, û ew ê red bike.
Wê hingê ez ê hêza xwe
nîşanî Misrê bidim. Piştî wê
ew ê wan bihêle derkevin.



Mûsa jiyanekê nû di
nav Mîdyaniyan de dît.


Ew jiyana çolê fêr bû,
zewicî û bû şivanê pêz.

Çil sal derbas bûn û Misir
bû ji dîrokê û bireke dûr.

Mûsa dev ji hêviya
dîtina gelê xwe berda.



Mûsa, çaroxên xwe ji
piyên xwe derxe, çimkî ew
cîhê ku tu pê lê dikî, erdê
pîroz e. Ez Xwedayê bav û
kalên te, Îbrahîm, Îshaq
û Aqûb, im.






Lê ew ê ji min bawer
nekin ku te ez şandime.
Ew ê tenê bikenin.



Hele gopalê
xwe bavêje erdê!

Çi?
Gopalê min!



Ew bûye
marekî kujer!



De bi dûvika
wî marî bigire.



Va ye ew careke
din bû gopal!



De here Misrê.
Ez ê bi devê te re bim
û ya ku tê bêjî hînî
te bikim.

Wê birayê te Harûn
bibe alîkarê te.



Tê vegerî Misrê!
Lê divê em çî bikin
ji bo yên ku dixwazin
te bikujin?

Ev bû ye çî sal.
Hemû yên ku tiştêkî li
ser dîroka min dizanin
mirî ne. Wê tu kesî
min nas neke.



Di rê de, li dera ku wan şeva xwe lê derbas kirin,
Xwedê li rastî Mûsa hat û xwast wî bikuje.

Lê Sîpporayê kevirekî heste hilda, kurê xwe
sinet kir û çermê wî li navrana Mûsa da.



Bê guman tu
ji bo min zavayê
bi xwîn î.

Sîpporayê talûkeya li ser jiyana mêrê xwe
fêhm kir ji ber ku wî bi ya peymana
Îbrahîmî ya sinetbûnê nekiribû.

Ji ber ku jiyana Mûsa di talûkeyê de bû, bi cidiyeta
vê nîşanê ku Xwedê dabû gelê xwe hat bawer kirin.



Mûsa di dema qîrkirina
mezin de hate dinê dema ku
Firewn zarokên nêr dikuşt.
Diya wî ew veşart. Bi qenckirdariya
Xwedê, keça Firewn Mûsa dît û
ew wekî Misrî hate mezinkirin.

Hemû
rîspiyên Îsraîlî,
de werin
nêzik bin.

Wê Mûsa nîşanên
ku ew ê bikar bîne da
ku pê Firewn bide
bawer kirin û me bihêle
em ji wir derkevin we
bide nîşan.

Ew
kî ne?

Ew Harûnê
Lêwiyyî ye û yê
din jî dişibe me,
lê ew ne kole
ye.





Ji çil sal berê û ji
çaxê derketina min tu
tişt nehatiye guhertin.
Bîne bîra xwe ku tu tenê
ya ku min ji te
gotibû bibêji.



Xwedayê Îsraîl bi Mûsa
re peyvî. Xwedê dibêje ku
tu gel berdî da ku ew di
beriyê de di rêwîtiya sê rojan
de biperizin wî û qurbanan
jî jê re serjê bikin.

Xwedayê Îsraîl? He!? Ma ev Xwedê
kî ye ku divê ez bi gotina wî bikim?
Ev mesele pêkenok e. Ez nahêlîm
ku koleyên min sê rojan di
beriyê re herin.

Hûn tenê gelê min ji karên wan dîkin,
û niha jî ew dixwazin sê rojan ji
xwedayekî re ku ez qet nas nakim
biperizin. Ez dibînim ku bêtir karê
wan heye ku bikin.

Ji niha û pê ve,
divê ew kayê xwe bi
xwe peyda bikin da ku
kelpîçan çêkin.



Tu çima li me wiha dikî?

Tu kes ji bo çêkirina kelpîçan ji me re qirşek nayne.



Hûn tiral in, tiral!
Ji ber vê yekê ye ku hûn berdewam ji min dixwazin ku ez we berdîm û qurbanê bidin Xudanê xwe.

Hele wegerin ser karê xwe! Wê kayê nedin we, lê divê hûn hejmara kelpîçan jî kêm nekin.



Ma hemû tiştên ku we pêk anî ev bû ku barên me dûcarî girantir bikin? Tiştêkî ji rizgariyê!!? Û hûn dibînin ku Xwedê hûn şandine?



Ya Xudan, ji roja ku ez li ser navê te hatim vir û bipeyivim heta niha, xerabî pirtir bû. Te çima ez şandim vir?

Ez Xwedayê bav û kalên te me û min êşkişana gelê Îsraîlê yê xwe dîtiye û hewara wan jî bihiştiye.

Va ye dem hat ku ez soza xwe ya bi Îbrahîm re pêk bînim û vî gellî rizgar bikim û bihêlîm biçe welatê Kenanî. Mûsa, tê wan bi rê ve bibî.

Lê ez nikarim baş biaxivim. Wê Firewn guh nede min.

Wê Harûn axaftinê bike; tu li min guhdarî bike û jê re hemû tiştên ez dibêjim bibêje. Dî destpêkê de, wê Firewn guh nede we, lê ez ê nişanên mezintir nişanî wî bidim heta ku Misriyan bizanibin ku ez tenê Xwedayê rastîn im.





Firewn gazî aqilmend û sêrbazên
xwe kir û sêrbaz bi hunerên xwe yên
veşartî heman tişt kirin.



Nesert, îlahê maran
ê me, ji we re dibêje
ku hûn bêtir kelpîçan
çêbikin. **Ha, ha, ha!**



Hele binêrin!
Marê wî bi yên
me re şer dike!



Marê wî yên
me diqurtîne!



**Ew marên
me bi tevahî
daqurtandin!**

Xwedayê
afirandinê dibêje:
"Bila gelê min biçe."

Xwedê careke din bi Mûsa re civiya û jê re got ku çî bîke.
Gelê wî ew red kirin ji ber ku Firewn koletiya wan girantir kir,
lê Mûsa ji Xwedê bawer kir û guhdarî kir, tevî wî jê fehm nedikir.

Yahweh dibêje:

"Ji ber ku tu nahêlî ku
gelê min biçe û da ku tu
bizanibî ku ez Xwedayê
rastîn im, wê hemû avên
Misrê bibin xwîn."

Hele herin
sêrbazên min bînin.
Wê îlahê Nîlê ev
yeka bide
rawestandî.

Xwedê got ku tevî dîtina Firewn
wan nîşanên mezin ên ji Xudan,
wê dilê wî hişk be,

Avê çemê bû xwîn,
masî mirin û bêhn ket çem.

Lê belê digel vê kerametê
mezin jî ya bi destê Xwedê...
Firewn bi vê yekê bawer nekir.







Gelo ew çi cudahî dike?
Bi hezaran îlahên me hene.
Bê guman îlahê Çemê
Nîlê hêrs bû ye.

Min *tiştêkî* wiha di jiyana xwe de qet
nedîtiye. Heta kanî û birkên biçûk jî bûn xwîn.
Gelo wî çi got, navê Xwedayê wî çi bû?

Çimkî yê bi Mûsa
re dibêje ku Xwedayê
wî Xwedayê yekta ye.

Xwedayek?
Ev yeka *dûraqil* e.

Sêrbazên min jî
dikarin heman tiştî bikin.
Ez ê bi sêr û hileyên we
bawer nekim.

Heft roj di ser lêxistina av derbas bû, Mûsa
careke din dadgerîkirina Xwedê li ser Misrê anî.

Bila av bi
beqan tije bibe.



Ji nişka ve avên xwînê yên bi bêhna
pîs bi mîlyonan beq ber anîn.



Mala min
bi beqan
tije ye.

Seranserê Mîsrê bi
beqan hatiye dagirtin.
Îlah hêrs dibin!

Hele kahnên
me li ku ne? Ma ew
nikarin tiştêkî bikin?



Êyyyyy!



Ew çima bêtir
beqan ber didin?
Ma Mûsa têra me
neda me?

De binêrin...
Sêrbazên Firewn dikarin
beqan jî çêbikin.



Tu çima nahêlî ew herin
çolê wekî ku wan jî te xwestin?
Em nikarin xwe hê bêtir ragirin.

Belê ezbenî.

Hele gazî Mûsa
bikin. Jê re bêjin
ku ez dixwazim bi
wî re biaxivim.



Ji Xwedayê xwe bixwazin
ku beqan dûr bixe. Heger ew wiha
bike, ez ê gelê te berdim ku
qurbanan serjê bikin.

Tu bêje ka kengî
beq bimirin û ew
ê bi ya te bibe.

Sibê zû.

Baş e! Bi vî awayî
tê bizanibî ku yekî
mîna Xwedayê
Yahwe tune ye.



Gava Firewn dît ku beq di wextê de mirin, wî dilê xwe hişk kir û nehişt ku yên İbrani biçin.

Çi te hişt ku tu bibînî ku Xwedayek wiha kir? Dibe ku ew tenê diyardeyeke xwezayî ye.

Ev çi Xwedayek e ku welatê me bi beqan tijî dike?

Ser de jî çawa Mûsa dizanibû ku ew ê biqewime? Yanî gelo wî karibû wê pêşbînî bike? Û wî çawa dizanî ku ew ê di eynî dem de bimirin?

Ax, hele huş be û rêş bike, an na em ê tu carî bi dawî nekin.



Va ye tevahiya toz li Misrê bû pêşû.



Xudan ji Mûsa re got: "Ji Harûn re bêje ku bila destê xwe dirêj bike û toza erdê bixe da ku ew li seranserê welatê Misrê bibe pêşû."



Wiiiiii!

Aaaax!!



Ev tê çi wateyê ku hûn nikarin pêşûyan çêbikin? Wê gel bifikire ku Xwedayê wî ji yê me bihêztir e! Hûn tenê sêr û hîleyan dikarin bikin.

Lê ezbenî, bê guman ev karê Xwedê ye. Tu kes nikare tiştên ku wan her du kirine bike. Em bê hêz in.

Hele herin vê gotinê ji Mûsa re bişînin. Jê re bêjin heger Xwedayê wî pêşûyan dûr bixe, ez ê bihêlim ku yên İbrani biçin û xizmeta Xwedayê xwe bikin.



Erê rast e pêşû çûn, lê ez nahêlîm kole ji vir derkevin.

Gava Firewn dîsa dilê xwe hişk kir, Xwedê bi Mûsa re peyivî.



Xwedê dibêje:
"Ez ê kermozan bişînim ser Misrê. Lê vê carê ez ê ferq û meylî bixim di nav Misrî û İbraniyan de.

Wê di nav gelê min de kermoz tune bin. Bi vî awayî, wê her yek bizanibe ku ez Xwedayê tevahiya erdê me!"



Bavo, ew çima kahinên me nikarin vî zilamî **bisekinînin**? Gelo **hêza** wan li ku ye?

Ez tu tiştî li ser olê nizanîm. Ez tenê bala xwe didim karê xwe.



Wek ku Mûsa gotibû;
di nav İbraniyan de tu kermoz tune!

Hele herin gazî Mûsa bikin.

Îcar herin û ji Xwedayê xwe re qurbanan serjê bikin, lê ji welatê Misrê bar **nekin**.

Em ê herî kêr sê rojan rêwitiyê bikin.

Min destûr da we ku hûn biçin, lê hûn ê pir dûr nekevin. Û niha jî de here bi Xwedayê xwe re bipeye û jê lava bike ku kermozan ji me dûr bixe.

Xwedê dîsa bi Mûsa re peyivî.

De here ba
Firewn û jê re bêje:
"Gelê min berde ku
biperizin min.

Heger tu nekî,
ez ê kuleke giran li
ser keriyên we bînim
û wan di zevîyan
de telef bikim.

Lê wê Xudan
ferq û meylî bixe
nav keriyên Îsrailî
û Misriyan."

Lê dîsa, Firewn dilê xwe hişk kir.





Gelo çî diqewime?
Heta duh dewarên
me sax bûn!

Divê destê
Mûsa yê zalim û
geveze di vê meselê
de be.

Ez dibihîzim ku ji
ber wî tiştên ecêb li
dîwana Firewn
diqewimin.

Di nav van qeza û belayan de,
Mûsa bi lava û bi bawerkirina bi Xudan,
Xwedayê Îbraniyan, berdwam kir.

Heywanên me
bi tevahî telef
bûne û yên we
jî sax in.

Ew Xwedayê
bav û kalên me
ye ku hat ji bo me
ji koletiya we ya
bêrehm xilas bike.

Kahinên me jî îlahên me re qurbanan
peyda dikin. Wê gayê me yê pîroz hêrs
bibe û dawiyekê jî vê meselê re deyne.

De here û ji Firewn re bêje ku ew
pir dereng e. Hemû gayên me yên pîroz
telef bûn û mirin. Wê gel hêrs bibin dema
ku bizanibin ku îlahên me nikarin xwe ji
vî Xwedayê Îbraniyan ê ecnî biparêzin.

Gelo îlahên
Misriyan li ku ne?
Ma tu hêz bi
wan tune?

Lê Firewn dilê xwe hê hiştir kir.

Derketin 9: 1-7



Mûsa û
Xwedayê wî
yê ecnî gel
dixapîne.

Em li ser
rûyê erdê
miletê herî
bihêz in.

Û ez im Xwedê –
serwerê herî bihêz
li ser erdê!

Em ê heyfa xwe
ji wan dewarên
telef bûyî hilînin.
Wê dewarên din ji
nû ve ber binin.



Yahweh –
tu li ezmên li ser
textê mezin rûne
û li seranserê erdê
serwer bike.

De here berdeyam bike
û nîşanî tevahiya Misrê bide
ku tu serwer î û divê hemû
mirov di dawiyê de xwe ji bo
dixwaza te bitewînin -
û navê te yê mezin jî qebûl bikin.

Ji bo pêkanîna
dixwaza te gelo
divê em hê çî
bikin?

Kulma xwe
bi xweliya tifikê
tije bikin...





Ax, pir diêşî!
Nalet li Xwedayê
Îbraniyan be!

Ey Firewn,
de were ser hişê
xwe û bihêle ev gelê
melûnî ji welatê me
derkevin.

Ez îro nikarim derkevim
pêşberî Firewn ku sêr û
hûnerên xwe çê bikim.
Ez ji ber van birînan bi zor
li ser lingên xwe
disekinim!

Wê Firewn me
nehêle em bi van
birînên kêmgirtî li
pêşîya we werin.

Sêrbazên Firewn nikarîn derkevin
pêşberîya Firewn ji ber wan kunêran li ser
bedena wan û bedana hemû gelê Misrê.

Lê dîsa... tevî êşa mezin
ku gelê wî dikişandin,
dîlê Firewn qet nehat guhertin.

Derketin 9:8-12



Serê sibê zû rabe,
li ber Firewn bisekine
û jê re bêje...





Xwedê dîsa dibêje: "Gelê min berde ku biperize min."

Vê carê, ez ê hemû belayên xwe bişînim ser we ji bo ku tu bizanibî li tevahiya dinyayê yekî wek min tune ye.

Ez ê sibê van çaxan, zîpîkek wisa giran bibarînim ku ji roja ava bûye heta niha tiştekî wisa li seranserê Mîsrê neqewimiye.

Hele rabe tevahiya keriyên xwe û her tiştên xwe yên derve bîne bixe axuran...

Çimkî gava zîpîk bibare, wê hemû mirov û heywanan li çolê bimirin."



Ey bêaqil - Ma tê gotinên vî pêxemberê çolê yê dîn bawer bikî?

Hin Mîsrî ji gotina Xudan tirsîyan û bi lez çûn hemû xulam, xadim û keriyên xwe anîn axurê.

Misriyên ku guh nedan fermanê,
zirareke mezin hem li ser mirovan
û hem jî li ser heywanên wan ket.

Xwezî malxweyê min
guh bida gotinên Xwedê
yên ji devê Mûsa ve
derketin.





Pir,
pir dereng e!
Xezeb li me hatiye
barandin!!



Ax, ey Sêtê hêzdar, îlahê tevlîhevî
û bahoza, em ji te **hêvî dîkin** ku tu
van bahozen tirsak bisekinîn!!

Bê guman
tu ji vî
Xwedayê
nedîtî yê
Mûsa
mezintir
î.

Belê, Mûsa,
serokê Îbaniyan
rast gotibû,
em li hindir
elwe ne.

Bavo, ez ditirsim.
Ma yê agir û bûz
bi ser me de jî
bikevin?

Em bi gotinên
Mûsa dîkin.

Sêt, îlahê me yê
bahoza ne wekî
Xwedayê Îbrani ye.



Ox, gelek
xirab e.



Min vê carê
guneh kir.

Xudan rast e,
ez û gelê xwe
sûcdar in.

Ji Xudan lava
bikin. Êdî bes e
ev zîpik û gurmîna
birûskan.

Hûn ê êdî li
vir nemînin.

Ez ê destê xwe
dirêjî Xudan bikim...
Lê ez baş dizanim ku
tu û karmendên te,
hê jî ji Xwedê Xudan
natirsin.



Li gorî gotinên Mûsa yên rast, gava Firewn dît
ku bahoz sekiniye, wî dîsa dilê xwe hişk kir
û yên İbrani jî berneda ku ji Xwedê re biperizin.



Û Xwedê carekê din
Mûsa şand ba Firewn.

Xudan, Xwedayê
İbraniyan wiha dîbêje:
"Ma heta kengê tê xwe li
ber min nizim nekî?"

Heger tu gelê min
bernedî, ez ê sibê
kuliyan berdim nav
welatê te. Wê rûyê
erdê binixêmin û
erd neyê dîtîn.

Ew ê tiştên
hindik ên ji we re
mane bixwin."



Gelo wê heta kengê
ev zîlamê hanê ji me
re bibe dafik?

Hele bila
gel biçin.

Ma Firewn
hên nizane ku
Misir wêran û
helak bûye?



Mûsa gopalê xwe bi ser welatê Misrê
ve dirêj kir; û Xudan bayekî rojhilatî û
dijwar rakir. Ba bi şev û roj rabû.

Li seranserê welatê Misrê kulî
bariyan û her derê tije kirin.
Kulî ewqas pir bûn ku tişteki wiha
berê tu car çenebûbû û piştê
jî wê çenebûya.

Li seranserê Misrê, hemû dar û
giyayên çolê hatin wêrankirin.

Wê hingê rewşa
bajaran jî ne baştir bû...



Gelo ew çima Firewn guh nade Mûsa?

Xwedayê Mûsa careke din tiştê ku Mûsa pêşbînî kiribû kir.



Her tişt ku Mûsa pêşbînî kiribû rast derket.

Îcar em ê wêran bibin.



Ey Osîrîs, de îro xwe xurt û bihêz nîşan bide.

Gêb, ey îlahê giya û şinahiyê, ma tu nabînî ka ev Xwedayê Îbraniyan çî bi dexlên me dîke?

Careke din, Firewn gazî Mûsa kir û soz da ku wê bihêle gel herin. Lê çaxê Xwedê kulî ajotin derve, Firewn dîsa dilê xwe hişk kir û nehişt ku dev ji koleyên xwe berde.

Wê hingê Xwedê kir ku tarîtiyeke gelek tarî bi ser Misrê ve dakeve. Ew di sê rojan de ji şeveke biewr û reştir bû, lê tenê di malên İbraniyan de tu tarîti tune bû.



Min dikaribû te berî niha **bikuşt**,
lê wê rastiye were nîşandan ku îlahên
me li hember ye we ne xwedî hêz û
qewet in.

Hele ji ber çavê min
derkeve. Ez ê careke
din rûyê te nebînim,
çimkî di wê rojê de te
bimirî.

Bila bi gotina te be!
Em ê careke din
hevdu nebînin.



Xudan dibêje wê belayeke dawî hebe û wê çaxê wê Firewn bi derketina me ji Misrê kêfxweş bibe. Îşev, di nivê şevê de, wê wêranker di welatê Misrê re derbas bibe. Wê di her malbatekê de her kurekî pêşî bimire. Wê Xwedê gunehê vê şevê ceza bike.

Di nav tevahiya civaka îbraniyan de, bila herkes ji malbata xwe re bexrekî bikire.

Divê ew hinekî ji xwîn hildin û li serder û kêlekên deriyê malê bixin ku wê tê de bixin.



De herin ba malxweyên xwe yên Misrî û ji wan zêr û zîvan bixwazin. Xwedê dilê wan xweş kiriye. Ew ê wan **bi serbestî û bi pirrani** bidin we.

Tişt mistên xwe bipêçin û serê sibê zû ji bo rêketinê amade bin. Hûn ê careke din neyên vir.



Dayê, çima bavo deriyê me bi xwînê reng dike?

Xwedê dibêje: "Dema ku ez xwîna li ser deriyên we bibînim, ez ê bizanibim ku hûn ji min bawer dikin û ez ê li hindirê malê tu kesî nexim."



Bavo, çima ev
şeva ji şevên ên din
cûda ye?

Xwedê dibêje ku divê em
goştê xwe yê biraştî yê li ser
êgir bi giyayên tûj re bixwin
da ku em êş û jana xwe
bi bîr binin.



Û bi nanê bê hevîrtirşk
ji ber ku em ê bilez ji
Mîsrê derkevin.

Ev roja ji me re destpêka
rojan e. Em ê her sal di vê
demê de wekî Cejna Derbasbûnê
pîroz bikin û bi bîr binin ku
Xwedê me ji destê Firewn
rizgar kir.

Îşev, wê Xwedê wêrankerê
xwe bişîne ku hemû kurên
pêşin ên ku jê bawer nakin bikuje.
Lê gava ku ew xwînê bibîne,
ew ê di ser wê malê re derbas bibe.



Wek ku wêranker wê şevê di ser bajêr re derbas bû,
bi hezaran kes mirin. Yên ku bawer kirin û xwîn li
deriyên xwe xistin saxlem man.





Careke din Firewn
gazî Mûsa kir.

Lê Firewn li rûyê Mûsa neniherî.

Min guneh kiriye.
Ez dest û lingên te maç dikim
ku tu ji Mîsrê derkevî û tevahiya
Îbraniyan jî bi xwe re bibî.
Xwedayê te Yahweh ji ya ku ez
dikarim wêdetir e. De berî tu
bî rê kevî min pîoz bike.

Çawa ku Xwedê soz dabû bayên wan, piştî 400 salan ew ji
Mîsrê derketin. Yên Mîsrî zêr û zîv û xwarin dan Îbraniyan û
her tiştê ku ew dixwastin û karîn bi xwe re hilgirin birin.
Ew ji bo zarokên Îbrani bûyereke dîlşa bû; Roja yekem a miletekî nû.



600,000 zîlam digel jin û zarokan ji Mîsrê
derketin da ku ber bi Welatê Sozdayî ve biçin.

Xwedê rê nîşanî wan da bi ewrekî bi siya di rojê de
û bi stûneke agirîn bi şewq û ronahî di şevê de.



SUPERBIBLE.TV